

Li Ser *Tractatus* û Li Ser Ziman”ê Wittgensteîn -1-

Adnan Fırat Bayar*

*“Tîştê di nava ziman de tê derbirin,
bi ziman nayê derbirin”*

Ludwig Wittgensteîn

Ji mirovan werî, ziman; tenê mabesta têkiliyê, hevpeyvînê û xweîfadekirinê ye. Ev têgihîştin, her çiqas tiştê rast be jî ne têr e û bi taybet jî, ji bo felsefeyê li ser ziman, me nagihîne qad û astên cihê û pêwîst. Jixwe, eger em bixwazin li ser tiştê bifikirin, bi taybetî jî di nava serpêhatiya felsefeyê de ev tişt eger hatibe nirxandin, ew fikirîn hem dibe wek dubareyekê û hem jî, ji aliyeke din ve dibe afirandineke nû. Raman tiştêkî wisa ye ku gelek caran dubare nabe, wexta ku dibe jî di eslê xwe de diguhere; angû dubare jî guhertinek e. Wexta em li ser felsefeyê kûr dibin, di nava wê kûrahiyê de em hem xwe diafirînin û hem jî nivîsara ku dixwînin diafirînin. Wekî mînak mêjiyê me ne mêjiyê Wittgensteîn e, dema me ne ya wî ye, erdnîgarîya me ne erdnîgarîya wî ye.

Kengê me fêhm kir ku ziman ne tenê navgînek ji bo binavkirin, hêmakirin û yan jî nîşandana tiştêyan e û bi heman awayî ne tenê ifadeya hiş e; emê bizanibin ku ziman li ser hiş û bîra mirovahiyê bi xwe, xwedî bandoreke mezin e. Em dikarin bibêjin ku lewma Filozofê mezin yê Elmanî Ludwîg Wittgensteîn; ji wexta 29 saliya xwe ku berhema xwe ya felsefî ku gelek namîdar e (*Tractatus Logico-Philosophicus*) derxist holê û heta mirina xwe giraniya xwe dabû ser vê mijarê. Ji ber ku filozof, li

* Lêkolîner û civaknas.

pey eslê meseleyê bû, dixwest li ser zemînekê rasteqîn û eşkere xwe îfade bike û bi vî îfade kirinê jî pirsgirêka felsefî ya herî girîng û bingehîn derbixe holê. Ango wexta ku mijara ziman daye destê xwe ne bi awayekî rasthatinî û bêwate ku nayê fêhm kirin vê mijarê bi pêş xistiye. Belê, li ba *Wittgensteînê* zana û hişyar ziman eslê meseleyê ye.

Em bibêjin, ji bo ziman, beriya pirsên wekî “*ziman bi kêrê çi tê*”, “*tem-sîliya ziman çawa ye*”, divê em pirsên wek “*ziman çi ye*”, “*ziman çi dizane*”, “*sîmorên/bendên ziman çi ne?*”, “*sirûştê ziman çi ye?*” bikin. Wexta li tevahiya felsefeya Wittgensteîn jî tê nêrîn; tê dîtîn ku di pêşiya pêşkêşkirin û derbirina nêrîn û ramanan; çavkanî û navgîniya wan fikr û ramanan –ku ew ziman bixwe ye- girîngtir dibe û bi pêş dikeve. Ango heta em nizanibin ziman çi ye, bendên wî çi ne, bi wî çi dibe, çi dikare bêje û çi nikare bibêje; divê em ji vî xalî xwe derbas nekin û neçin tiştên ku li ser ziman pêk tên. Ew beredayî ye. Zanîna ziman ji emilandin û pêkhatina ziman û tiştên ku bi mabesta ziman li dar dikevin girîngtir e. Belê, li gorî Wittgensteîn tiştê balkêş û girîng ne emilandina ziman e; ziman bixwe ye.

Felsefe û nêrînen Wittgensteîn a li ser ziman, di jîyan û serpêhatiya wî ya felsefî de, ji aliyê gellek kesî ve di du danan de tê bi dest xistin. Dîroknasên felsefeyê, felsefeya Wittgensteîn li ser du danan nirxandine û li gorî gellekên wan, filozof di van her du danên xweyê felsefeyê de ramanên ji hev cihê derbiriye û wek di nakokiyê de ye. Tê qebûlkirin ku Wittgensteîn di dana xwe ya ewil de li pey felsefeyêke pozîtîvist e, xwe sipartiyê agahiyêke zanistî, ji metafîzîkê xwe dûr kiriye û her wiha ev nêrînen wî di berhema wî ya felsefî ya sereke di *Tractatus* de hatine îfade kirin. Ev pirtûk, ji aliyê hinek felsefevanan ve wek “pirtûka pîroz a pozîtîvîzmê” hatiye nirxandin. Di heman demî de ev pirtûka ku di ciwanîya Wittgensteîn de hatiye nivîsîn, di dîroka felsefeyê de bi taybetî jî li ser felsefeya ziman wek çavkaniyêke sereke tê qebûl kirin.

Lê li gorî nêrîna me di jîyana felsefeya filozof de, gava ku bi baş û balkêş bihêt nêrîn; nakokiyêke wisa mezin tune ye. Ev gengeşî bila niha bimîne. Lê emê berê xwe bidin *Tractatusa* wî û ji vê behremê, bi kurtasî çî tê fêhm kirin li ser wî bisekinin.

Wittgensteînê Li Derdora Pozîtîvîzmê

Wexta ku Wittgensteîn *Tractatus Logico-Philosophicus* nivîsand, bawer kiribû ku pirsgirêkên felsefî yên bingehîn sererast û bi awayekî mayînde çareser kiriye. Lewra filozof li pey misogeriye bû û tiştê ku tanî ser ziman jî, li gorî wî ji bo pirsgirêka insan yên têgihîştinî û zanayî ya li ser zemîn divê bi rêbazeke misoger bihêt îfade kirin:

"Rastiya ramanên ku di vê derê de hatine pêşkêş kirin ji min re bêguman û misoger xuya dibin." (*Tractatus, Pêşgotin*)

Bi wêrekî hewl dabû ku sînorên ziman bi çend kirariyên mantiqê biedline û dîsa bi awayekî ku di dîroka serpêhatiya felsefeyê de nehatiye dîtin; sînor û pîvan deyne ser rapeyvan. Her wiha li ser wateyê, li ser pîvana watedariyê; da ku rapeyvek kengê dibe xwedî mane û kengê ji maneyê derdikeve; birêkûpêkî û qeyd û bendan danî. Teoriya klasîk a ziman di perspektîfa Wittgensteîn de ji xwe re sînor dibîne. Dibîne lewra ziman zemîneke wisa ye ku sînorên wî sînorên zanîn û têgihîştina insan e. Ziman ne navgîn e, lê berî navgîniyê ew, qada zanîn û nezanîna mirovahiyê, pêkan û destnîşana agahiyê û cîhwarê hiş e.

Wittgensteîn ji bo sirûştî û kirariya ziman û tekiliya wî ya bi dinyayê ve rave bike; xwe wekî peywirdar hesibandibû. Çawa ku Kant xwestibû ji bo ramanê bendan deyne, Wittgensteîn jî xwestibû ji ziman re van bendan deyne û bi vî awayî xwe bisipêre pêkan û hêza ziman. Ji ber ku em nikarin ji nava ziman derkevin û wexta em ji nava wê derkevin jî dîsa em di nava wê de ne.

Pêwendiya hevtemsilkirinê ya di navbera ramanê û ziman de saz dibin û ev her du qad li ser lêlatên xwe biserûber dibin, ziman û raman hem bi binyewî hem jî bi kargîni tên dahûrandin. Her wiha ziman wek wêne tê hesibandin ango ziman dibe wêneya ramanê, ziman û raman hev dorpêç dikin, hev temsîl dikin, hev nîşanî hev didin. Ji ber vê yekê bendên navbera tiştên "tên zanîne" û "nayên zanîne" jî derdikeve holê.

"Hemû felsefe nîrxandina ziman e" (*Tractatus, 40031*)

Wek tê zanîn pîrsgirêka insan a felsefî, herî mezin li ser pêwendiya berahiyê û ramanê ye û kurtasiya maneya felsefeyê, bi rast avakirina pêwendiya navbera ramanê û berahiyê ye. Ango tiştên em difikrin û dizanin di hişê me de ne û tiştên hene û bera ne jî di derveyê hişê me de ne. Eslê meseleyê, lihevhatina hiş û derveyê hiş e. Tiştê ku hiş dizane, di derveyê hiş de jî heye en na; mesele ev e. Ji ber ku felsefeya Wittgensteîn jî bi eslê xwe hewldaneke analîtîk e li ser ramanê û berahiyê, bi giştî wek felsefeyeke pozîtivist hatiye nîrxandin. Her wiha di vê felsefeyê de fêhmkirina berahiyê, bi baş û rast fêhmkirina têkiliya navbera ramanê û berahiyê ve girêdayî ye. Eger em li ser fikr û ramanê biseknin - da ku ev çi ne/çi nîn in- divê em xwe bigihînin qada ziman, ewil em bizanibin ku ziman çi ye. Fêhmkirina siruşt a ziman dibe şert û merc ji bo fêhmkirin û zelalkirina ramanê û rastiyê. Lewra ev tişt li ser ziman, bi ziman û di ziman de tên pêk anîn. Îmkîna zanîna berahiyê, girêdahiyê îmkîna axaftinê ye, em li ser çi bikaribin bi axifin emê bikaribin xwe bigihînin rastiya wî û zanîna wî. Tiştên em dikarin li serê bi axifin emê xwe

bikaribin bigihînin rastiya wî jî. Pêkana peyvê di heman demî de pêkana rastiye ye. Ji ber vî awayî felsefe, di pêşiya hemû nirxan de divê sî-nora ziman kifşe bike û bi eşkere derxe holê.

“Em çawa li ser berahiyê difikirin, hevok jî dibe pêşnumayê wî berahî” (Tractatus, 4.01)

Ji bo, nirx û dehûrandina vê meseleyê, Wittgensteîn; di navbera ziman, raman û berahiyê de rastênheviyek(paralel) danî û bi “teoriya wêneyê” (*Picture theory*) ev hat bibîranîn. Her wiha prisgirêken felsefî dibin pirgirêkên ziman, çareserkirina pirsgirêkên ziman dê bibin çareserkirina pirsgirêkên felsefî. Ji ber vê yekê ziman, dibe wêneyek ji bo berharî û haqîqetê.

“Hemû tiştên ku tên axaftin divê bi eşkere bên axaftin û li ber hemû tiştên ku li serî nayên axaftin divê bêt hişbin” (Tractatus, Pêşgotin)

“Hemû tiştên tên fikirin dikarin bi eşkere bên fikirin. Hemû tiştên tên gotin bi eşkere dikarin bên gotin” (Tractatus, 4.116)

Sînora Ziman:

Li gorî Wittgensteîn lêgerînên felsefî û hewldana gihîştina rastiye, zanîne û hemû qadên heyîniye divê li ser yek esasî bilind bibe, ev esas û binyat me bigihîne nerînên mîsoger. Ji ber ku binyata insan ziman e, esl û fêslê ziman ji bo me divê bibe sedema têgihîştin û dîtina rastiye û berahiyê. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ji bo insan pirsgirêkên cihêreng û cur bi cur tune ne; lê pirsgirêkeke tenê û mezin heye. Rastî li ser yek binyatî pêk tê, rastî yek e, ji yek bingehî diafire û di heman demî de ev rastî xwe li ser yek bingehî dide nîşan û zanîn. Ango tenê ne ji bo çareserkirina rastî û berahîtiye di heman demî de ji bo nasîn, cudakirin û fêhmkirina wê jî dîsa em li pêdiviya vî rêbazî û binyatî rû bi rû dê werin. Ev yek, hem rastiye nîşanî me dide, hem dide nasîn, hem xwe diafirîne hem rêbaza xwe li dar dixê; bi kurtasî hem ji bo xwe heye hem jî ji bo me heye. Hemû pirsgirêk dikevîn bin yek pirsgirêkekê. Her weha, ji ber ku yek pirsgirêkekê heye wextê ku ev pirsgirêk bihê çareser kirin hemû pirsgirêk jî dê bêtin çareserkirin.

“Nekeve nava pirsgirêkên pişkî, her daîm bi tevahî here ser yek pirsgirêkekê, here cihê ku nêrîneke azad li wê derê ye; welew ev nêrîn ne nêrîneke eşkere be jî” (Notebooks. 23)

“Peywira min, tevahî bi ravekirina sirûştta rapeyvan pêkhatiye” (Notebooks. 39)

Wek tê fêhm kirin Wittgenstein, ji bo vê bingehê "ziman" tûne pêşberî me. Ziman, bi sirûştî, kargînî, têkilî û bi qada xwe yê girîng û bêhempa vê rêyê ji me re vedike. Lê ev ziman ne zimanekî ku zimanzan an jî zanist pêk tûnin e. Berî her tiştî, em bêjin wek zimanzanek -li ser, da ku ziman çawa tê pêk anîn- nasekine yan jî wek sirûşt-nasekê -li ser çêbûyî yê dinyayê- nasekine. Ne lêkolîneke empîrîk e; lê lêkolîneke binyewî û mantiqî ye. Ziman me bi rastiyeke wisa rû bi rû tûne ku ev rastî, binyatek nîşanê me dide û me digihîne asteke wisa ku ew der, ji persgirêkê re dibe ser û bin û destpêk. Ziman, sînorên rastiye nîşanî me dide. Emê bi ziman bizanibin ku em dikarin li ser çî xeber bidin û li ser çî xeber nedin, emê bikaribin çî misoger bikin û çî nekin. Wekî mînak hevokeke wek "niha berf dibare" û "rengê berfê gelek xweşik e" bi binyatên xwe ne yek in. A ewil wek wêneyekî ye û ji ber vê yekê xeberdana li serê watedar e; lêbelê ya duduyan tişteki ne dîyar e û ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ne xwedî wate ye jî. Her wiha peywist e ku em sînor ji ziman re bînin rojevê.

"...Armanca kitêbê, xêzdanîna sînora ramanê ye, jê bêtir-ne sînora ramanê- a ifade kirina ramanê ye: Lewra ji bo xêzdanîna sînorên ramanê divê em bikaribin li ser her du aliyên sînorên ramanê jî bifikirin. (Ango divê em bikaribin li ser tiştên ku nayên fikirandin jî bifikirin) (Tractatus, Pêşgotin)

Lewra raman xwedî naverokeke wisa ye ku ziman wê nahewîne. Ji ber vê yekê ziman nikare ramanê bisînor bike. Tiştê ku ramanê sînor dike, pêkana ramanê ye. Belê pêkana ramanê, ramanê bisînor dike; raman, pêkana ramanê bisînor nake.

Her wiha tenê di nav ziman de xêz tê danîn û zen dikim ku tiştê li wî alî dimîne tewş e" (Tractatus, Pêşgotin)

Ji vê nêrînê jî baş tê fêhm kirin ku emê nikaribin sînorên ramanê bi ramanê deynin (Kant wisa kiribû) sînor, tenê ji bo ziman pêkan e. Belê Wittgenstein felsefê wek "nirxa ziman" (TLP 4.0031) dide dest. Însan hebûneke biziman e û nêrîna insan a navendî jî dîsa ev e:

"Sînorên zimanê min sînorên dinyaya min e". (Tractatus 5.6)

Ev aforîzmaya meşhûr a Wittgenstein, ji bo nêrînên wî yê li ser tekilîya ziman û dinyayê (heyberiyê) ku bi "teorîya wênehiyê" hatiya nasîn, bi kurtasî ifade dike. Teorîya wênehiya ku têkiliya ziman û heyberiyê bi awayekî misoger daye ber hev û ziman wek wêneya heyberiyê rave kiriye, di heman demî de sînorên tiştên bînan gotin jî dide nîşan. Ziman, tiştê ku ifade dike çî be ew xwedî wate ye jî. Ziman tenê tiştê ku heyberin dikare bike wêne. Tişteki ne li heyber be ji bo ziman bê wate ye lewra

ew nayê wênekirin. Sînorên wêneyê çi bin ên ziman jî ew in û sînorên ziman çi bin ên wateyê jî ew in. Ziman wateyê, wate zimanê xwedî sînor dike. Eger em bixwazin watedâriya rapeyvêkê bipîvin, emê wê rapeyvê bidin ber berahiyê. Avahiya ziman di heman demî de avahiya heyberiyê jî dide nîşan. Her wiha li ser xebateke avahiya ziman, emê bi hêsan xwe bikaribin bigihînin rastiya tiştan. Analîzkirina ziman ji bo me dê bibe sedema analîz kirina heyberiyê ji. Ji xwe li gorî Wittgensteîn nîmandin, meseleyekî zimanî ye; dinya ew tişt e ku bi rapeyvên me tê ziman. Em dinya xwe bi zimanê xwe bi rê dixin. Dinya ew tişt e ku; ji tiştên di nav rapeyvên me pêk tên:

“Ev dinya, dinya min e. Ev yek, ji vê derê xuya dibe; sînorên zimanê min, sînorên dinyaya min nîşan dike”

“Dinya û jiyana yek in”

“Ez dinyaya xwe me. (Gerdûna piçûk)” (Tractatus. 5.62 – 5.63)

Serqîsse, hiş, xwe dide ber dinyayê, tiştê ji dinyayê fêhm dike tîne ser ziman. Ew çax ziman dibe eyneya dinyayê. Ango ziman dinyayê diedilîne. Her wiha tiştê di dinyayê de tune be nayê ser ziman. Wekmînak, rapeyvên felsefî yê metafîzîk bi rastî di dinyayê de bê hember in û ji ber vê jî nayên ser ziman. Ji ber ku nayên ser ziman ne xwedî wate ne. Wate, tenê di dinyayê de li dar dikeve. Hincar emê bêjin dinya çi ye?

“Dinya, hemû ji rewşan pêk tê.

Dinya yekûna diyardeyan e, ne (yekûn)a tiştan e.

Dinya bi rêya diyardeyan tê zanîn û her wiha ev, hemû diyardeyan e”. (Tractatus. 1 – 1.11)

Ev aforîzmayên meşhûr ji bo têgihîştineke rasteqîn a li ser dinyayê pek bê, hatine gotin. Eger armanca me ji bo dinyayê şayesandineke rasteqîn be divê em heyberiyên ne tiştên wek bi serê xwe, xweru û bê têkilî bibînin. Ev nêrîn dê me negihîne encamekê. Divê em cidahî bêxin navbera “tiştan” û “diyardeyan”. Wekî mînak, wexta ji me şayesandina ev odeya em tede runiştine bixwazin; em rabin bêjin mase, pênuş, kitêbdank, komputer, paldank... hwd. nabe. Tiştê ji me hatiye xwestin di heman demî de rewşa van tiştanê jî. Divê em van, ji tiştahiyê derxin bêxin nava rewşahiyê: Li ber maseyê pisîk mexel bûye, serê xwe daniye ser her du piyên xwe yê pêş. Kitêbeke Wittgensteîn li ser paldankê maye û vekiriye.... Eger bala we kişandibe ev şayese ne li ser objeyan e lê li ser diyardeyan e. Her wiha wexta em ji bo dinyayê bibêjin “dinya ev û ev tişt in” ne rast e lewra *“dinya yekûna diyardeyan e, ne (yekûn)a tiştan e”*. (Tractatus. 1.1)

Bi vê mabestê Wittgensteîn ji bo teoriya xwe yê ziman spartekeke ontolojîk pêk tîne. Ziman dê bi dinyayê ve were girêdan, her wiha tiştê ku ew çax bê dehûrandin dê “dinyaya ziman” be. Ango wexta em li ser “zi-

manê dinyayê" bisekinin emê li ser "dinyaya ziman" jî biseknin. Divê di dinyaya ziman, di mantiqa ziman de bê biserûber kirin.

"Rapeyv ne tevliheviya navan e" (Tractatus 3.141). Çawa ku obje bi tenê dinyayê li dar naxin, bi tenê ne dinyayek in, têgih û kelîme jî bi tenê zimanek naynin meydanê.

Dinya,-ku- yekûniya heyberiyana e tê vê wateyê: Ji bo çêkirina wêneya dinyayê divê di nav van de têkilî hebe. Divê ew ne "tişt" bin lê divê ew "rewş" bin. Eger em dinyayê ne wek rewşê bibînin emê tiştêkî jî dinyayê fêhm nekin. Dinya bi objeyan (Obje) nayê rave kirin, bi rewşan tê rave kirin. Em nikarin bêjin obje hene yan jî tune ne. Lê em dizanin ku em mecbûrê tiştêkî ne; sirûsta ziman me bi mecbûrî têxe nava gotinê. Ango gotin, di nava ziman de bi esl û fêslê xwe, bi mantiqa xwe me dide xerberdan. Em bi mantiqa ziman xeber didin. Têkilîdanîn û biserûberkirina navbera objeyan ji ziman pêk tê.

Her wiha tiştê ku tê gotin "çawabûn" a objeyan û qewaman e, ne "çibûn" a wan e. Objeyên ser ziman û le tenê, têne nîşandan û navdan.

"Rapeyvek, tenê dikare bibêje ku obje çawan in, lê nikare bêje ku birser çî ne" (Tractatus 3.221)

Wexta ku bi hevdudaniyeke objeyan a nû biqewime, ew çax tê gotin ku di dinyayê de guhertin pêk tên.

"Çawa ku objeyên bicihwar em nikarin wan bêcihwar bifikirin û çawa ku tiştên bizeman em nikarin bi tu awayî wan li derveyê zeman bifikirin; her weha em tu objeyî nikarin bêpeywendahiya bi objeyên din ve bifikirin" (TLP 2.0121)

Her obje bi pêwendiyê tê rojevê û bi vê pêwendiya xwe mane bi dest dixwe. Ango em nikarin bêjin ku objeyekî tenê heye lêbelê dinya heye û jixwe dinya hatibû ravekirin: *"Dinya ji rewşan pêk tê"* (Tractatus.1.1) Dinya ne yeko yeko tevahiya tiştan e; bil'eks dinya têkilî û hevpariya objeyan e. Ji ber vê yekê dinya rewş e. Lewra *"Berahiya empirîk bi yekûna objeyann xwedî sînor e"* (TLP 5.561) Wekî mînak "S, P" ye û "R, Q ye"

Di gel vê yekê, di bikaranîna Wittgensteîn de "dinya" û "berahî" jî ne yek in. Belê dinya yekûna rewşan e. Lê emê nikaribin bêjin ku berahî tenê ji dinyayê pêk tê. Dinya tiştêkî wisa ye ku di nava berahîyê de ye. Ango berahî, dinyayê xistiye nava xwe. Tiştê ku berahî têxe nava xwe jî tiştên di nava dinyayê de zahfir in. Dinya derfetekê berahiyê ye. Berahî tiştêkî wisa ye ku hemû rewşên pêk tên di nava wî de ne û hem jî rewşên pêkan di nava wî de ne. Hem yê ku bûne hem jî yê ku nebûne di navê de ye. Jixwe Wittgensteîn gotiye: *"P û 'ne P' dijî maneyên hev"*

in, lê dijberiya wan li ser yek û heman rastî ye” (Tractatus. 4.0621). Ango tişteke û neyîniya wî tiştî li ser heman berahîyê ne. “*Karakterîstîka teoriya min a sereke ev e: P, bi “ne P” re li ser yek û heman sîmgeyê ye....*” (Notebooks. 94) Ango her du yek berahiyekê didin nîşan:

“Diyardeyên erênî û neyînî hene: Eger rapeyva “ev gul ne sor e” rast be wî çaxî sîmgeya wî neyênî ye. Lê ev rapeyv rast be jî, heta em nizanibin maneya “ev gul sor e” maneyekê erênî ye; ji “ne sor e” dê tenê ev mane dernekeve....” (Notebooks. 94)

Mesele, hebûna rengekî ye. Tiştê ku “sor”ê û “ne sor”ê rast yan jî çewt dike heman tişt e, sorîfî ye.

Belê, tuneçayî û hîçayî “tune” ye, lewra tişteke em bêxin ber wan tuneçayî. Lêbelê em berahiyê bi mantiqê dikin xwedî wêne. Ango hîçayî û tuneçayî nabin xwedî wêne. Her wiha erênî û neyênî heye, li ser berahiyê ne, her du yek in. P û “ne P” yek in. Ev berahî li ser pêkanekê dar dikeve, xwedî yek pêkanekê ye. Ew pêkan dinya ye. Mantiq ji me re dibêje “belê dinya bi awayekî heye; lêbelê mumkin bû ku bi awayekî din jî bibûya”. Jixwe ev awayê din tunebûyan ev awa jî, ji bo me nedibûya manedar. Belê berahî li ser du tiştan e: Tiştên derdikevin û tiştên mumkin bû derbiketina. Ev her du bi hev re berahiyê didin nîşan, tiştên pêkhatî jî, tenê dinyayê dide nîşan. Rastî jî zanîna dinyayê ye.

Ji ber ku ziman ne tenê li ser rastiye xeber dide, li ser pêkanan jî dikare xeber bide; tê wê maneyê ku ziman ji rastiye mezintir e. Her wiha ziman ji dinyayê mezintir e. Û her weha ziman û birrahî digihîjin hev. Lewra ziman û berahî li ser yek mantiqekê ne.

Wêne:

Wêne, tenê rastiye temsîl nake her weha avahiya wan jî temsîl dike. Pêwendî û hevdudane yêneyan -ku berahiyê pêk tîne- bi avahiya ziman dibin xwedî avahî. “*Teşeya wêneyê, teşeya berahiyê ye*” (Tractatus. 2.18 - 2.2)

Li gorî vê nêrînê, ziman wek wêje ye û berahiyê temsîl dike. Ev temsîl-kirin bi awayeke wisa çêdibe ku avahiya ziman û avahiya berahiyê jî tîn ber hev. Wekî mînak wextê em bibêjin “kevir hişk e”, “kevir” (ku wêne ye), kevirê (ku obje ye) temsîl dike. Kevir kevirê temsîl dike. Ev e, her du bûne yek: Kevir, kevirê temsîl dike. Belê her du bûne yek, lê di gel vî qasî her du ne yek in. “Kevir” ne kevir e. Yek wêne ye û yek jî obje ye. Ji ber vê yekê ziman temsîl-kirina berahiyê ye û rastiya xwe ji berahiyê distîne. Lê ne berahî bixwe ye.

Belê wêne (ziman) obje temsîl kir lêbelê wêne nikare xwe temsîl bike.

Wêneyeke wênesazek, teşeya çêkirina wêneya wê wênesazê nîşanî me dide, lê nikare vê teşeyê bike wêne. Teşe ne wêne ye û nabe wêne. "*Wêneyekê, dikare hemû berahiyên ku xwedî teşe ne bike wêne*" (Tractatus. 2.171); "*Lêbelê, teşeya xwe yê wêneyê nikare bike wêne: Tenê dikare raxê*" (Tractatus 2.172). Ango, wêne tiştêkî temsîl dike, tiştêkî dibêje, şayese dike, lê nikare xwe şayese bike: "*Xwe, nikare bixwe derveyê teşeya temsîlkirina xwe*" (Tractatus. 2.173-2.174)

Ziman dikare li ser berahiyê xeber bide lê nikare li ser birrahiya xwe xeber bide:

"Tiştê di nava ziman de tê derbirin, bi ziman nayê derbirin"
(Tractatus. 4.121)

Emê bikaribin li ser ziman xeber bidin lê emê nikaribin ziman xeber bidin. Lewra ziman xeberdan bixwe ye, teşe û awayên xeberdanê ye, xwe li dar dixê, ne em wî li dar dixin. Wî şert û mercên xwe danî ye, em jî li pey diçin; ne ku em datînin, ew jî li pey me tê. Em di navê de ne, ne ew di nava me de ye. Em nikarin xwe ji navê derxin; lewra wexta me xwe ji nava wê derxist, dîsa em xwe pê derdixin. Ango dîsa em pê rû bi rû dimînin. Li cihê ku em ji nava wê derdikevin dîsa ew heye.

Bi rastî, armançake mezin a di nav helwest û hedefên *Tractatus* de yek jê diyarkirina sînoren ramanê ye. Belê ev ne mumkin e, lê dîsa ev hedef heye. Welew ku ev yek; bi awayê "ji ramanê re sînore ne mumkin e" serencam bibe jî, ev hedef e. Ango divê em bizanibin ku em nikarin sînore ji ramanê re deynin. Ji ber ku raman nikare derkeve derveyê pêkana xwe, nikare ji xwe re sînore jî deyne.

"....Armanca kitêbê, xêzdanîna sînora ramanê ye, jê bêtir-ne sînora ramanê- a ifade kirina ramanê ye: Lewra ji bo xêzdanîna sînoren ramanê divê em bikaribin li ser her du aliyên sînoren ramanê jî bifikirin. (Ango divê em bikaribin li ser tiştên ku nayên fikirandin jî bifikirin) (Tractatus, Pêşgotin)

Lewra raman, xwedî naverokeke wisa ye ku ziman wê nahewîne. Ji ber vê yekê ziman nikare ramanê bisînore bike. Tiştê ku ramanê sînore dike pêkana ramanê ye. Belê pêkana ramanê, ramanê bisînore dike; raman, pêkana ramanê bisînore nake. "*Her wiha tenê di nav ziman de xêz tê danîn....*" (TLP, Pêşgotin 3) Belê raman nikare sînore ji xwe re deyne, ne mumkin e; lêbelê dikare ji ziman re deyne. Raman, dizane ku ziman dikare li ser çî xeber bide û li ser çî xeber nede, çî manedar e û çî manedar nîn e; lêbele nikare derkeve derveyê pêkana xwe. Ji ber ku raman dikare derkeve derveyê rastiyê, anga xwe dikare bigihîne çewtiyê; mumkinê wî ye ku bizanibe rastî çî ye û çewtî çî ye. Ev, derketina derveyê

ziman e. Raman dizane pêkana rastiye çî ye: Berrahî ye. Lêbelê nizane pêkana ramanê çî ye. Raman wek wate diafirîne, rastî li dar dixê, li ser qeyd û bendên rastiye çûn û hatin dike, dizane pêkana zanîne çî ye û çî nîn e. Raman, tşkiliya suje û objeyê pêk tîne, van konfigrasyonan he-wandiye nava xwe, lê nizane li derveyê wê çî heye? Nizane ku dê nizanibe li ser çî bifikire. Nizane ku dê çî nizanibe.

Berahi teslîmê pêkana ramanê ye. Em di nava pêkana ramanê de dibin xwedî tîgiştina berahiyê.

Bi vî awayî, ev dehûrandina li ser ziman û ramanê tî pêkanîn; me digihîne encameke wisa ku dubendiya navbera insan û dinyayê hildide. Di serpêhatiya kevneşopiya felsefeyê de, mirov û دنیا bi girani du qad û du astên cihê ne. Lêbelê ev her du tîşt li ser zimanê Wittgensteîn digihîjin hev, suje û obje li ser yek xalî, li ser ziman xwe der dikin. Ziman, hem suje (kirde) ye hem jî obje ye. Yê ku nayên gotin, nayên dîtin jî.

Armanca Wittgensteîn a li ser ziman dehûrandin û fêhmkirina ziman e. Ji ber vî yekê ziman li ba Wittgensteîn ne ji aliyê gramer(rêziman) ve lê bi awayekî rexneyî ya li ser mantiq û wateya ziman hatiye qebûl kirin. Ango ev xebat, ji xebateke gramerî û wir ve ye. Her wiha ziman, tecrubeya me ye lewra tecrubeyên me yen li ser dinyayê tev; bi mabesta zimanê pêk tîne. Ji ber ku dinyayeke nehatiye ceribandin ji me re tune ye, dinyayeke tune be jî nayê ser ziman. “*Sînorên zimanê min, sînorên dinyaya min in*” (Tractatus.5.6)

Çavkanî

- Wittgenstein, Ludwig. 2001. *Tractatus Logico Philosophicus*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
Wittgenstein, Ludwig. 2004. *Defterler (1914-1916)*. İstanbul: Birey Yayıncılık.

FERHENGOK

Bémanend: Emsalsiz
 Binyewî/Binyatî: Yapısal
 Berahî: Gerçeklik
 Biserûber: Düzgün
 Dahûrandin: Çözümleme
 Diyarde: Olgu
 Fişarde: Abes
 Hevdudane: Bileşik
 Hêmakirin: Simgelemek
 Hiş: Bilinç
 Kargîn: Fonksiyon
 Kevneşopî: Gelenek
 Kirarî : İşlem
 Kirde: Özne
 Lêlat: Düzlem
 Nimandin: Temsil etmek
 Nîgar: Fîgur, Motif

Pêkan: Olanak
 Pişkî: Kısmî, tikel
 Puxte, Cewher: Öz
 Rapeyv: Önerme, söylev
 Raserî: Trancendental, Aşkın
 Rastênhev: Paralel
 Rastî: Doğruluk
 Rêziman: Gramer
 Serpêhatî: Serüven
 Sirûşt: Doğa
 Somkirin: Kapsamak
 Spartek: Dayanak
 Şayesandin: Betimlemek
 Şûnde: Uzam
 Tewş: Saçma
 Têgihîştin: Algılama
 Xweru: Yalın

